# Servîs + Xizmet

- **Şêwirmendî** di hemû pirsên qanûnî yên kar û civakî da
- **Parastina qanûnî** ya belaş bo endamên me di hemû pirsgirêkên têkilî mafê karî da
- **Nûnertîya** belaş **li ba dadgehan,** dezgehên sîgortaya civakî û dezgehên lihevanînê li gor biryarên parastina qanûnî yên ÖGByê
- **Alîkarîdayîna** sendîkayî bo **bêkaran û ya gaxanê**
- **Sîgortaya berpirsyarîya pîşeyî û ya parastina pîşeyî ya qanûnî**
- **Sîgortaya qezayên de dema vala da, ya lêçûnên qezayan li nexweşxaneyê û ya lêçûnên binaxkirinê**
- **Alîkarîkirin:** sindoqa felaketan, sindoqa Karl Maisel û sindoqa Anton Proksch
- **Alîkarî ji bo kûrsên** ku xizmeta perwerde û paşperwerdeya pîşeyî dikin
- **Alîkarîya grevan**
- **Pişûyên guncav** li xanîyên me yên pişûyê li Bad-Hofgastein, Velden und Krumpendorf am Wörthersee
- Karta endametî – **erzankirin li ba gelek şîrketan**
- **Agahîyên herî baş** bi rojnameya endametî ya PRO-GEyê ya bi navê **Glück auf!** û kovara ÖGByê **Solidarität**
- **Aboneya belaş ya kovara Cult & Card**

**Lêçûnên van xizemtan bi tenê bi rêya pişkên endametîtên dan. Bi vî rengî serxewebûna sendîka PRO-GEyê tê misogerkirin.**
Sûda bitemamî ya ji avantajên endametîtîya te bi tenê bi rêya pêşkêşkirina rast ya pişkê tê wergirtin.

PRO-GE
DIE PRODUKTIONSGEWERKSCHAFT

**www.proge.at**

## Têkilî

**Sendîka PRO-GE**
1020 Wien, Johann-Böhm-Platz 1
✆ 01 534 44 69-100
✉ mitgliederservice@proge.at

**www.proge.at**

**Sekretaryata herêmî:**

**Burgenland**
7000 Eisenstadt, Wienerstraße 7
✆ 02682 770-61053 ✉ burgenland@proge.at

**Kärnten**
9020 Klagenfurt, Bahnhofsstraße 44
✆ 0463 58 70 62-414 ✉ kaernten@proge.at

**Niederösterreich**
2500 Baden, Wassergasse 31
✆ 02252 443 37 ✉ niederoesterreich@proge.at

**Oberösterreich**
4020 Linz, Volksgartenstraße 34
✆ 0732 65 33 47 ✉ oberoesterreich@proge.at

**Salzburg**
5020 Salzburg, Markus-Sittikus-Straße 10
✆ 0662 87 64 53 ✉ salzburg@proge.at

**Steiermark**
8020 Graz, Karl-Morre-Straße 32
✆ 0316 70 71-276 ✉ steiermark@proge.at

**Tirol**
6010 Innsbruck, Südtiroler Platz 14-16
✆ 0512 597 77-67000 ✉ tirol@proge.at

**Vorarlberg**
6900 Bregenz, Reutegasse 11
✆ 05574 717 90-68000 ✉ vorarlberg@proge.at

**Wien**
1020 Wien, Johann-Böhm-Platz 1
✆ 01 534 44-69663 ✉ wien@proge.at

**Mohr:**
Herausgeber und Hersteller: Österreichischer Gewerkschaftsbund, Gewerkschaft PRO-GE, Johann-Böhm-Platz 1, 1020 Wien; für den Inhalt verantwortlich: PRO-GE Öffentlichkeitsarbeit; Grafik: PRO-GE; Foto: Lisa Lux; DVR 0046655, ZVR 576439352



KUR

# HÊZÊ BIDE TIŞTÊ KU TE BIHÊZ DIKE.

**BIBE ENDAM!**
Pişka te – Xizmetên me
**www.proge.at**

PRO-GE
DIE PRODUKTIONSGEWERKSCHAFT

Stand: Jänner 2024

# Em ji bo TE çi dikin

Çima tu tirimbêl, xanî, jîyan an jî heta gera xwe ya pişûyê sîgorta dikî - lê daxwazên xwe yên qanûnî di warê karî da na?

- Em parastina qanûnî ya berfireh û xizmetên sîgortayê pêşkêş dikin.

Bide ber çavên xwe ku, şîrket bikarin bi tena serê xwe biryaran bistînin, me yê wê gavê bi zor peymanên kolektîv (komî), mûçeyên kêmtirîn, demên karî yên biîntîzam, parastina karkeran, pişûya kêmtirîn û tiştên hê bêtir hebûna.

- Em ji bo mafên te û derfetên karî yên dadî têdikoşin!

# Bi tenê EM nûnertîya berjewendîyên te dikin

Em her sal bi karsazan ra li ser gelek **peymanên kolektîv** didin û distînin. Li wê derê, mûçe, demên karî, pereyên pişû û yên gaxanê û gelek derfetên dîtir ên giring tên biserûberkirin. Bi vê rêyê, em her sal, tevî bilindkirina mûçeyan, başkirina derfetên karî jî di warên kanza, elektrîk, kankerî, enerjî, kîmya, kaxiz, cam, zeytên kanzayî, cawkarî, cil, post, xurek, xweşî, berdestkirina karkerên demkî, birêveberîya gilêş û ava gemarî, herwiha birêveberîya çandin û daristanan da bi dest dixin.

# Me BI HEV RE gelek tişt bi dest xistin!

- **Salane bilindkirina mûçeyan**
- **5 hefte pişûya bipere**
- **pereyên pişû û gaxanê**
- **peredayîna bo karê zêde**
- **berdewamîya mûçeyan dema nexweşîyê**
- **Ewlehî li cihê karî**

**... û hê bêtir**

**Tenê sendîkayên bihêz serkeftî ne.**

**HÊZÊ BIDE,**
**TIŞTÊ KU TE BIHÊZ DIKE.**
**BIBE ENDAM!**

# Pişka endametîya PRO-GE

Pişka endametîya PRO-GEyê mehane dike yek ji sedî ji mûçeya tevayî (brutto) (di nav de karê **zêde,** bexşîş û **peredayîna zêde**).

Hemû **peredayînên** taybet û vegerandina lêçûnan nayên hesibandin (mînak lêçûnên roja karî û yên xewê, vegerandina lêçûnên rêwîtîyê).

Dema karê demkurt piştgirîya wê beşek ji mûçeya tevayî ye.

## Çawa pişka te digihe me?

Gelek rêbaz bo razandina pişkên endaman hene:

- Di şîrketê da, bi rêya dabirîna mûçeyê
- Bi rêya kişandina destheqê destûrdayî SEPA (qutkirina ji kontoyê)
- Bi rêya kişandina rasterast ji sazîya sîgortaya malnişînîyê

## Pişkên kêmkirî

| Pişkên sabît (bi Ewro) | mehane | salane |
|---|---|---|
| Karkirina demkurttirîn | 3,00* | 36,00 |
| Malnişîn | 3,00* | 36,00 |
| Bêkar | 3,00* | 36,00 |
| Çaxa dayîkînîyê ya pêşdem | 3,00* | – |
| Şagirt, xwendekar | 1,00 | 12,00 |
| Endametîya duqat | 10,00 | 120,00 |

*01.07.2024 - 5,00 €

## Demên bêpişk

Wekî endametî tê hesibandin, gava ku berî wê bi kêmanî şeş mehan endambûnî hebû

- Çaxa dayîkînîyê ya dadî
- Çaxa dêûbavbûnê li gor qanûn an şîrketê (herweha meha-bavtîyê)
- Stînerên pereyên nexweşan
- Xizmeta leşkerî yan civakî
- Bêhnvedana bo perwerdeyê
- Bêhnvedana bo çavdêrîya li malbatê (dema serbestbûna bi temamî ji karî)
- Alîkarîya bo pêşketinê

# Kêmkirina bacî

**Pişka te ya endametî ya ji bo sendîka PRO-GEyê bacên li ser te kêm dike.**

Belgenameyên pişkên endametî yên dayî ji bo beyannameya bacan li ser malpera me **www.proge.at** piştî têketinê tên dîtin.

Heger pişka endametî yekser ji mûçe an jî ji malnişînîyê were kişandin, wê demê bac ji berê da bi rêya hesibandina mûçeyê ya şîrektê an jî sazîya sîgortaya malnişînîyê li ber çavan tê girtin. Di van rewşan da belgenameyeka dezgeha darayî (malîyetê) hewce nake.

## Ez bi rastî çiqasî didim?

**Avantaja baca mûçeyê bi rêya pişka sendîkayê**
(Pişk bi ewro):

| Tevayî | | Baca mûçeyê *) | | Safî | Pereyên berhevkirî ji baca mûçeyê mehane |
|---|---|---|---|---|---|
| Mûçeya mehane | Pişka endametî | Neendam | Endam | Pişka endametî ya **rast** | |
| 1.600,00 | 16,00 | 17,24 | 14,04 | **12,80** | **3,20** |
| 1.700,00 | 17,00 | 34,21 | 30,81 | **13,60** | **3,40** |
| 2.000,00 | 20,00 | 81,14 | 77,14 | **16,00** | **4,00** |
| 2.200,00 | 22,00 | 118,05 | 111,45 | **15,40** | **6,60** |
| 2.400,00 | 24,00 | 160,94 | 153,74 | **16,80** | **7,20** |
| 2.600,00 | 26,00 | 210,09 | 202,29 | **18,20** | **7,80** |
| 2.800,00 | 28,00 | 259,25 | 250,85 | **19,60** | **8,40** |
| 3.000,00 | 30,00 | 308,41 | 299,41 | **21,00** | **9,00** |
| 3.200,00 | 32,00 | 357,57 | 347,97 | **22,40** | **9,60** |
| 3.400,00 | 34,00 | 406,73 | 396,53 | **23,80** | **10,20** |
| 3.600,00 | 36,00 | 462,12 | 447,72 | **21,60** | **14,40** |
| 3.800,00 | 38,00 | 527,67 | 512,47 | **22,80** | **15,20** |
| 4.000,00 | 40,00 | 593,21 | 577,21 | **24,00** | **16,00** |

*) Karker bê nirxê daxistinê yê qezenckerên bitenê an jî xwedîkerên bitenê
Baca mûçeyê ya mehane = mûçeya tevayî jê sîgortaya civakî kêmkirî (18,07%) li gor tabloya bibandor hatîye hesibandin; Çêkirî: Rêbendana 2024yan